


## Kurd û Girîk..

### Hevbendîyên hevsûbûnê û ayînî



#### Selewat Gulîyamuv

Dikevinda peyva (Hêlînî) digotine Yonanîyan û dinêv Kurdan da peyva alay-Alay bi (zarê kurmancî) bo tîpeka leşkirî dihate bikarînan. Hêlînîyan bixwe peyva (Girîk) li ser wan hozan dana bû ewên li çan û rexên Êlîyade û Êbîrîya û Êlîrîya akincî û li wî serdemî Hêlînîyan tuxîbê rojava yê Êlîyade diparast.

Vîda yê Hîndu-Arî çend hozên şerker hebûn ko herdem û tim diberîkanê da bûn, bo cengê û berevanîkirina tuxîbên xo diberhevbûn.



Germanyên kevin jî, her wek babikalên wan yê Hîndu-Arî peyva Her- Hari < bikar diîna jibo navkirina hêzên leşkirî yê hozên xo nemaze ewên hêş dibirine ser dervey sinûrê erdê xo. ev têrma Hîndu- Arî ya taybet bi layenê leşkirî vekuru li cem Îranîyan bi şêweyê (kara) hebû.

Ev hemî girove dîyar diken ko navê (Girîk) li cem Hêlînîyan dibineret da jibo peyva Hîndu-Arî ya hevpişk kuru- kærati- ko tîpeka leşkirî ye jibo bergirîkirinê dizivirît, li gel wê dîtinê hevdigirît ko enerîtekê kevinê piranîya milletên Hîndu-Germanî ye ko Hêlînî jî digehne wan milletan lê bi renekê piraktîkî, divêt wek dû milletên cuda li Hêlînî û Girîkan nenêrîn.

Dikevinda Girîkan-Hêlînîyan li gel Kurdan li mîzuputamîya û li rojavaya asîya, bîyavên cugirafî yê berîn hebûn, ko xodî êk kargîrî bûn. li Esparte, ko civakê wê beruvajî civakê Êlîyade yê parêzgar bû, û erdê Espartîyan û Kurdan yê dabeşkirî bû bo yekeyên kargêrî û binavê Kurdî Oba dihatine nîyasîn, hebûna vê peyva Kurdî ya nemaze dizimanê Girîkî da nîşana hebûna hevbendîyeka mukume dinêvbera Hêlînî û Kurdan da li mîzuputamîya.



Çend nimûneyên dî, peyva Gel- gel- millet ya Kurdî li gel peyva Ageli ya Espartî hevdigirn, ko tev gencên Esparta dijîyekê dîyarkirî da dipêgîrbûn bibine leşker, dizimanê Kurdî da peyva Gel < agel bi hevra ramana (hoz yan êl) didet û ev peyve jî weko deng û raman li gel peyva Oxlos-millet ya Girîkî ya kevin hevdigirin.

Ji alîyê ayînî ve, hijmareka zor ya navên xudavendên Girîkên kevin eger piranîya wan nebît, dibineret da bo zimanê Kurdî yê kevin yanko zimanê vîdî dizivirin.

Dîyaus-zîvs,\* ko binavê Dîyaus-Vîdî ko navekê Kurdî yê kevine û ramana esmanê sahî didet, ewê ji alîyê Hîndu-Arîyan kuru ve dihate perstin, paşra jî ji alîyê Hêlînîyan ve her heman xudavend bi navê xudavendê payedar dihate perstin. darêştina vî navî bi vî rengî ye: dizimanê Kurdî da peyva (ferman-kar) dît ramanên (dît-dibînteve-dinalît) didet ko dibineret da jibo peyva Vîdî (kar-ferman) dîv-div vedigerît, ko ramana (teyîsî-birsqî) didet û dzimanê Kurdî da peyva (zîv.. zêv) ko ji saxletên vî kanzayî teyîsîn û birsqîne ev saxlete di ramanên peyva (dîv) da heye lewra xuya dibît ko navê Girîkî yê kevin jibo peyva (zivs) xudavendê Hîndu-Arîyan yê hevpişk-Dîyaus dizivirîteve.



Ganîmed ganimed: îranyên kevin gelek dişehrezabûn li çêkirina (vîno-mey) ji tirî, ko weko vexwarn li rêuresimên ayînî dihate bikarînan, vexwarn meya ji ava tirî dirustkirî nerîtekê kevin bû ji babikalên xo vîdayên Hîndu-Hryên kuru wergirtbû. bawera Girîkên kevin ew bû ko xudavend mîna mirovan li gel hev dicemyên û kom dibin û mêhvandarîyan li ser çîyayê olumpîya jibo vexwarn meyê yanko vîno yê saz diken. li demê vexwarn vînoyê pehlewanek dişêwazê xudavendan da xuya dibît û wî pehlewanî navekê Kurdî yê kevin (ganîmed) li ser heye. dizimanê Kurdî da peyva gund ramana (gund-hevcemîyan-kom) didet, pişka duyê ji peyvê (med) jibo peyva mey mey ya Kurdî dizîvrît li gel zêdekirina et yan ed bo (komkirinê) ti-T dihête xwandin û gotin.

çandina tirî diresen da li çîyayên Zagiros li rojavaya asîya destpêkirî ye, tirî bi rengê berbelav li mîrnişîna mîhrî ya Kurdî li hizarîya sê ya berîya zayînê hebû, paşra li dewleta mana ya Kurdî jî ev berheme hebû pêşî li bajêrvanîya Hêlînî li hizarîya êkê ya berîya zayînê peyda bibît. Li gor efsaneyên Hîndu-Arîyan, xudavendên vîdî û li pêşîya wan Dîyaus dema (Sum) vedixwar qurbanî dipexşîn, ligor efsaneya vîdî (sîndoxa) maka (Sum)ê ye ko her heman ew nave yê evro



hoza (Sincab) ya Kurdî ewa li îranê akincî û li ser axa xo dijîn li wê devera rûbarê dîyala yê dikevinda nasîyar bi rûbarê sîndixa-kînda bikardînît. li (Rîk vîda)\*\* da hatîye ko (Sum) ji alîyê bazekî jibo (Mano)yê ko êkemîn mirov bû piştî tufanê jîyay hatîye revandin. mano babikalê êkê yê Kurdên kurmance (kur-erd yanko cih-Mano) kurên erd yan cihê Mano, ko ekadîyên Babilî bi Kotî bi navbirîne û efsaneya tufan û ew keştîya li ser çîyayê (Nîtsîr-Cudî) nîştî bi wanive digirêdayîne.

Di (Rîk vîda 4, 26 )yê da hatîye:

**4- Marut, ev sîvandokê ko gereke li berahîya tev sîvandokan bît.**

**ev bazê bilind fir û bilez-li berahîyê ye**

**çaxê bi tev heza xo û bêy rawestîyan û bi şaperên xo yê nrd**

**Qurbanî bo manwî, wek xoşîyek bo xudavendan pêşkêş kirîne.**

**7- bazî meya Sum îna, û bir:**

**bo hizar û deh hizaran ko bihevra hatîne givaştin**

**li wî demî (buramdihî aratî) hêla,**

**jîrmend ji coşîya (Sum)ê, ne ji jîrmendaye.**



Di mîtulujîya Girîkî ya kevin da (serxoşî), kanimîd bi serusîmayê bazekî bi erkê revandina Dîyaus-zivs radibît dema (kanimîd)ê kurê padişahê tirwade pez li kêlekên çîyayê (Êda) li asîyaya biçûk diçerand. bi vî rengî efsaneyên Girîkî yên kevin jî û bi pal piştîya zanistên dîrokî wê rastîya giring dûpat diken, ko nîştîmanê resen yê hozên Hîndu-Germanî û Vîdîyên Arîyayî kuru rojavaya asîyaye.

Li gor jêderên aşûrî yên sedeyê 9ê berîya zayînê, ne btenê çîyayê îda belko tevaya herêma dikevîte jûrîya çîyayên Zagirus dikevîte di çarçûvê memleketa mana ya Kotî-Kurdî da, û devera memleketa Êda li gel bajêrê zîvîya yê Kurdî hevdigirît yê ko serdem û lêkulînên arkîlujî li dewruberên wî bajêrî akincîgeheka bi navê (karamîka) dîtîyeve, ko bo sedeyên 14-9 berîya zanîynî dizivirît.

Efsaneyên Vîdî, xuya diken ko (Êda) kiça (Manu)y êkemîn mirov bû li ser rûyê erdî piştî tufanê bûye qurbanî dako nivşê mirovî yê berdewam bît. Êda ya xudavend hevbendyeka êkser li gel Kurdan hebû. û li gor efsaneyên Hîndu-Arî xudavend Êda bibû hevjinna Budihî. û ji dîroka (Hîrudut)î dihête zanîn ko êk ji şeş hozên Kurdî-MÊdî bi navê (Budî) bû.



Babikalên Kurdên Mêdî ko ser bi girupa zimanî ya Êranî li rojhelata asîya û li bakûrê wê jî belavbûyne. Hîrudut me haydar diket ko hoza sîvikîn ya Mêdî li Fraqîya û hoza Budîn ya Skîvî li bakûrî li ser kinarên derîyarîya reş hebûn. pîranîya mîtulujîya Girîkî ya kevin ewa sebarete revandina (Kanimîd)î ji alîyê bazekê li bilindahîya çîyayên (Êda), her heman mîtulujîya Arî ya Vîdî ye ewa li dûr revandina (Sum)î diket li gel amajedanê bi wê çendê ko cihê rûdana vê serbûrê rojavaya asîya bûye, ko nîştîmanê hozên Hîndu-Êwrupîyan bû.

Aşvînî-Dîuskur: di mîtulujîya Vîdî-Arî da xudavendên xodîkirina hespan herdû bira yê cêmik Aşvîn bi pîrozî dipejirandin, di wergêranê da navê wan bi vî rengî hatîye Asp-Aşvîna Asp-Asvinau. ji serubendên kuma bîranînan li xwandina stayşên ayînî yê di (Rîk Vîda) da hatînin nivîsîn, Aşvîn bitenê jibo xudavendên mezin (Êndira-Eknî-Sum) xo diçemînin. û hindek ji stayşên Vîdî behsê pîrozîkirina nevîyên (Manu-kurmancî) bo xudavendên xwedîyên hespan diken:

Rîk vîda 1,184



**5- Aşvînî, ev stirana pesinkar jibûna we hatîye danan  
nevîyên Manu, jibûna pîrozîya we ya mezin,  
ey mirovên paye bilind  
rêvîngîya xo jibûna dûmdarîya nifşê xo pêxemtî me tevav  
biken.**

Navê hozên (Oman Manda) \*\*\* yên Mêdî li hizarîya sê  
yê berîya zayînê ditêkstên Akadî yên Naram Sînî da hatîye  
ko akincîyên Zagirusin. û li hizarîya duyê berîya zayînê  
dîyasayên padişahên Hîtîyan da hatîye ko hozên (Oman  
Manda) texeka serbazî ne û ji dana bacê diazadkirîne.

Rîk Vîda xuya diket ko xudavend Aşvînî (Mîg Etirî) li gel  
(Manu)î serkêşê hozên Hîndu-Arî bû. Etirî li cem Girîkên  
kevin bi padişahê (axî Mîganan) dihate hijmartin, li demekî  
herdû birayên cêmk Dîuskura, xwedîyên hespan, her  
heman kesin eger hatine hevberkirin li gel Aşvînî Vîda-  
xwedîyên hespan. Li gor efsaneyê, Etirî yê Girîkî yê kevin ji  
nêv Mîganan hatbû derkirin, lewra jî di stayşên Vîdî da  
gelek daxwazîyan dixwînîn ko ji Avşînîyan hatîne kirin dako  
destê harîkarîyê jibo Etirî dirêj biken:

Rîk vîda 8, 73



## **7- Gelî Aşvînîyan bizanin**

**Etirî maleka parastî heye!**

**Bila harîkarîya we ya berhev bît!**

**Jibûna Etirî yê peyvdarê hejî**

**Agirî helken.**

Navê (Dîyaskur) Diaus-kure dibinert da bo zimanê Vîdî-Kurdî dizivirît û ramana (kurê Dîyaus (Zîvs) didet û heta niha jî dizimanê Kurdî û Yonanî da peyva Kure ramana (kur) didet.

Dîyaskura mîna Aşvînê xudavendê hesp û tev gilîsk û pêruyên hevbendîdar bi nubedarîya şevê û rojê dihête danan. Dîyaskura ji hêkekê yê peydabûy ko werdekeka bestî kirî, lê Aşvînê vîdî ji hêka Martand yê peydabûy!

Li gor lêkolînên arkîulujî xodîkirina hespan li Hîndistanê û li Yonanistanê nebûye û bo êkemîn car li hizarîya çarê berîya zayînê. Li gor Avêstayê hespên kûvî li başûrê çîyayên Oralê hatine kehîkirin dema berîya wî serdemî çend hozên Kurdan nemaze hozên xewarzim yên Mîtanî berev wê deverê ve ji rojavaya Asîya çûyn. Li serdemên dûv da li bakûrê kinarên derîyaya reş û paşra bi devera qewqaz ra ji alîyê bakûrê ve li pişt (Kîlîsîunt)ê ji alîyê başûrê ve, karê



xodîkirina hespan li dûmahîya hizarîya sê yê berîya zayînê gehîşte (Lîkîya) û Asîya biçûk. navê hespî dizimanê Hîruglîffî-Aubî Asuwa li navenda hizarîya dûyê berîya zayînê li gel navê Arîyan bo hespî êk digirin, welê dizimanê Êranî yê kevin da peyva Şuaka û li Hindî Svaka û Spaka hene. bi hevberkirina van navan bo hespî, bi piştirastî ve xuya di bît ko navê Lîkî-Lubî Asuwa û hesp yê ko heta niha dizimanê Kurdî da dihête bikarînan, ji alîyê Kurdanive nemaze Kurdên hoza Lak dema ji devera xo li Zagirusê berev devera Lîkîya-Lubîya ya kevin ve çûyn, û hejî dîyarkirinê ye ko hoza Lak ya Kurdî mîna Kurdên bextîyarî bi xodîkirina hespên resen dinavdarin.

**Perawêz:**

\*: dîrokvan xuya diken ko navê resen yê (Taûs) ko dayînê Êzîdî da yê pîroze, (Dîyaus)e ko xudavendê xwezayê ye li cem milletên Hîndu-Arî û li serdemê Mîtahur bi navê (Mîtira) hatîye nîyasîn-(wergêr).

\*\* : kevintirîn pertûke li cîhanê-(wergêr)

\*\*\*: ev nave heta niha jî li başûrê Akirê li ser rûbarê Xazrî maye û xelkê deverê dibêjinê (Omar Manda)-wergêr .



### Jêder:

- آريا القديمة و كوردستان الأبدية (الكورد من أقدم الشعوب)، صلوات گولياموف،  
ترجمة عن الروسية: د. اسماعيل حصاف، من إصدارات منتدى سور الأزيكية بتسلسل  
(٥٤٧) ، الصفحات ( ٤٠٥ - ٤٠٩).

W . ji Erebi: Şemal Akreyî